KOVARA

Cejna sersala we pîroz be! 1981

Sal 2 Hejmar 2 Zivistana 1981

RAYA

www.rayakurd.org

HINERA FOLKLORÎ

Notenivîs:-
Besîr Botanî



NASTÎNIM



Babo nastînim
Dayê nastînim
Derdê hewiyê
Ew jî nakşînim
Ez wî nastînim
Her wî nastînim
Da ez bi xweşî
Her dem bimînim

Dilê wî didu ye
Çavê wî birsî ye
Li malê tevçûye
Dayê nastînim

Jinên wî çar in
Ne dost û yar in
Çi gelek har in
Dayê nastînim

Wey ev çi jîn e
Derd û kul nîne
Xweş e û şêrîn e
Dayê nastînim

www.arsivakurd.org

GULSÊNÎ



Gulşê nî şê nî şê nî gul şên ya min mala min



Gulşênî, şênî, şênî
Gulşênya min mala min

Gulşênî du ne, dû ne
Mêhvanên me tev çûne
De were li nik min rûne
Gulşênî, şênî, şênî

Gulşênî sê ne, sê ne
Pir keçikên xelkê ne
Aliyê rezan de têne
Gulşênî, şênî, şênî

Gulşênî çar in, çar in
Gundên me bi robar in
Bi çiya û gul û dar in
Gulşênî, şênî, şênî

ERÊ RASTEY XEYABAN

Cemîl Beşîr



www.arsivakurd.org

Erê rastey xeyaban, Nesmîl giyan bexçey milet e
Erê kirasekey berit, çaw ciwan çîtî rût e

Giyan, giyan, giyan, giyan kewê gerdin be xalî
Lay, lay, lay, lay kuştimî perçemî xawî
Of, of, of, of mindalî çiwarde salî
Bo çi,bo çi,bo çi,bo çi şêti bûm bo xet û xalî

Erê bêne ser dil im, çaw ciwan naske penceket
Dena baweşênim ke, wird wird be egrîceket
Giyan.....

Erê pirsîm le çîmen, be qurban ew qebre kê ye
Fermûy qebrî Mecnûn e, şêtî kuştey Leylê ye
Giyan.....

HINERA NÛ

Notenivîs:-
Beşîr Botanî

Cejna sersala we pîroz be!

www.arsivakurd.org

EM MIROV IN

Helbest û awaz
Beşîr Botanî

Em mirov in,xakperest in,
Sosyalîst in,komunîst in
Dixebitin li dij vegirkeran,
Emperyalîstan û sitemkaran

Em cotkar in, em karker in,
Wek hesin in, wek agir in,
Pêşmerge ne bo nîştiman
Li jêr ala aştî yan her neman

Rêka şoreş, rêka xebat,
Rêka rizgarbûna welat,
Rêka azadî û serbestî
Em ê her ava bikin bi dostî



www.arsivakurd.org

Helbest:-
Meryem Botanî

HEY LO DELAL

1- Hey lo de - lal tu de

2- Wê - ra - nû xo - pa - nê

la - lî He - çî ro - je

gun dan li min ma - ye

tu meli ma lî xi - rû xa - lî

E - man e - man e - man e - man

Ro - na - hi - ya ça - vê mi - no

Tu de - la - lî xwes he - va - lî

Tu de - la - lî xwes he - va - lî

www.arsivakurd.org

Awaz:-
Beşîr Botanî

Hey lo delal, tu delal î
Heçî roja tu ne li mal î
Wêran û xopanê gundan
Li min maye xir û xalî
Eman, eman, eman, eman
Ronahiya çavê mino
Tu delal î, xweş heval î
Tu delal î, xweş heval î

Ji mêj ve li hêviya te me û
Dê rawestim ber bi welat
Ho gundîno, heçî bêjê
Va delalê dilê te hat
Bawer bikin çend heyna ma-
la babê xwe jê re bikim
Baştirîn diyarî û xelat
Baştirîn diyarî û xelat

Ho delalê dilê mino
Vê baranê çik e, çik e
Min got de tu rabe mehî-
nê berde ciwaniyê cilke
Ho xudê vê cîhanê û we-
latên dûr û biyaniyê
Ji min re neke mal û milk e
Ji min re neke mal û milk e

www.arsivakurd.org

Helbest:-

Mamoste Sebrî Botanî

ÇAVEN

Song



www.arsivakurd.org

ÊR IM

Awaz:-
Beşîr Botanî

Ji evîna te bû dilber
Giham çola waweylayê
Kul û derdan hilavêtim
Kelemper bûm li ber bayê
Hey hey hayê Ho ho hayê

Dîsan mûyek ji te nadim
Bi sed jolêt û Leylayê
Li pey te me, çav li te me
Heta mabim li dinyayê
Hey hey hayê Ho ho hayê

Her nûjen im di vê rê de
xwegir ez im ber belayê
Ev e soza min û canê
Birîna reş bi zav dayê
Hey hey hayê Ho ho hayê

Ji wê dilana germ û geş
Awazê jînê berdayê
Çavenêr im bibim zava
Kî dibêje du ses nayê
Hey hey hayê Ho ho hayê

---

www.arsivakurd.org



2- Heyran, Rewta(dumtek)helbesta ristên Heyran ne temam in. Heyran jî bi meqama Beyat û li herêma Hewlêrê tête strandin. Piraniya babetên Heyranan evîn, çelengiya keç - ciwaniya sirûştê ne.

Meqam Beyat



Heyran jî sê beş in.

A- Ser çiyayî

B- Pişderî

C- Deştî(Deşta Hewlêrê)

Ela-Weysî, vê meqamê stran e. Bi meqama Nehawend tête strandin.

Meqam Nehawend(do)

Meqam Nehawend(sol)



www.arsivakurd.org

Stranbêj bi peyvên"Azizîm- عزیزم" ve destpêdike û wê li ser notên(mî-la-mî-la)çar-pênc caran dibêje. Stranbêj sê-çar caran ji(mî-la-mî-la)derbazî notên(sî-do-rê)dibe û her carê li ser nota(rê)radiweste. Bi dû re derbazî notên(do-rê-mî)dibe û li ser nota(mî)radiweste, êdî texlîta vê meqamê ne Nehawend e. Lê belê Ecem e. Stranbêj paşê dîsan dizivire destpêkê.

Hîcran, vê meqamê bi helbestên sivik û bi meqama Beyat têtе strandin. (Binêre li notên Heyran, ew jî bi meqama Beyat têtе strandin.

Meqama dest, vê meqamê ji meqama Kurdî hatiye. Lê dengê (nota) 6 an (mî) cuda ye (nîv deng e).



www.arsivakurd.org

Dibistana

ARAM TÎGRAN

Ji bo fêrbûna muzîkê

_2_

Berhevkirina Beşîr Botanî

Demên muzîkê

1- Rond
(nota temam)

2- Blans
(nivnôt)

3- Newar
(çariknot)

4- Kros
(serbîn)
(binser)



Bijmêre û bêje sol bo kroş (serbin-binser)





www.arsivakurd.org

Ta hejmara 3

RÊKA PIYASÊ

Şêrko Botanî

Hîlir dibêje:-

Hiner xulam e. çiku amade ye ji bo xweşiya mirovan e. Lê axayê wan nabe, ta xizmeta ciwaniyê û rastiyê bike.

Evert Taube dibêje:-

Jîna bê stran û sema dê çi bibe?

Lesse Vikström dibêje:-

Keçên ciwan ne gelek in
Perçên muzikên min jî ne dirêj in

Cejna sersala we pîroz be!



www.arsivakurd.org

RAYA TU SER

Raya bi xwe hinermendeke cîhanî ye, bi hêz e, zana ye, xudan bîr û bawerî ye û aştîxwaz e. Raya sembolek e, sembola gelên sitembar e, sembola mirovperwerî, azadî û wekheviyê ye, sembola çanda Qereçiyan û evîna rastîn e, Raya sembola jinên vê demê ye. xebata wê ya li ser hinerê ji bo gelên cihanê serketinek e û ji bo mafên jinan peşketinek e.

UPPSALA — MUSIKFORUM

16.11.1980

Navê xuşka me ya hinermend Raysa Udovikova ye. Ew ji xelkên ordugehên Qereçiyên ku li nêzîkî daristanên Ukraniyayê dijîn. Di şerê cîhanê yê didwan de dê û bavên wê martîr(şehîd)bûne. Raya sêwî, birsî, derbeder û bêkes ma. Paşê di xaniyê zarokan de jiya û ji wê revî û ber bi Rûsyayê çû, da ku li ser bira û xuşkên xwe bigere. Bi dû re ew ji aliyê polîs ve hate girtin û li bajarê Dnjepropetrovsk karek li karxanê danê. Li wê derê kar kir û ji bo xizmeta hinera Qereçiyan û mirovperweriyê bû endamê tîpa hinerê.

Hinermenda mezin Raya, ji bo pêşdebirina hinera xwe çend salan li Moskvayê maye û ji wê derê navê wê li cîhanê belav bûye.

arsivakurd.org

ÇAVÊN ME HATÎ



Rojek ji rojan rojnamevanekî Norweçî ku yê bi nav û deng Tore-Jarl Biylenberg ji bo ku bi wê re raportajekê çêbike, çû Sovyetistanê. Her di wê çavpêketinê de dilê wî kete wê û paşê hevdu xwestin. Piştre wê di gel du zaroken xwe bar kir Norweçê. Mêrê Rayayê di nivîsarên xwe de gelekî kada Qereçiyan dike. Li ser wan dinvîsîne û wan ji bo xizmeta mirovperweriyê belav dike.



RAYA

Hevalno, Qereçî jî mirovin, Ew jî wek me ne û wek gelên din yên ku di vê cîhanê de hene. Qereçî jî sitembar in û ji me sitembartir in. Lewre kovara Muzîk û Hiner çêla rewşa wan dike. Lê pir mixabin ku gelek mirovên nijadperest, xeşîm û bê hiş hene, dibêjin ku Qereçî ne mirov in. Qereçî diz in û bi tiştekî jî nizan in. Rast e, ku hindek ji wan diz in. Lê Kurdên diz jî hene, Ereb û Tirkên diz jî hene. Lê Qereçiyên Xwefiroş tune. Ev jî xuya dike ku Qereçî dilpak in, dilsoz in û dixwazin di azadiyê de bijîn. Lewre xuşka me Raya dixwaze bi sema, bi muzîk û bi stranên xwe azadî, wekhevî, mirovperwerî û evînê hînî me bike.

Beşîr Botanî

www.arsivakurd.org

Ji gotinên nezanan

Rizgar Memo

Xumeynî dibêje:-
1- Muzîk afyon e.
2- Di Îslamê de muzîk, sema,û xweşî heram e. Lewra ez qedexe dikim.

Benî-Sedir dibêje:-
Muzîk nexweşiyek e, divê em gelên Îranê ji vê nexweşiyê rizgar bikin.

Mihemed Recayî dibêje:-
Divê em komara Îslamî ji mîkroban(hinermendan) paqij bikin.

M I Z G Î N Î

Ji gelên Kurdistanê re

Yên ku bixwazin bi kurdiya zelal stranên gelek xweş, temam û nekêm fêr bibin. Bila kovara "Muzîk û Hiner"-ê bixwînin. Ji lewre ev kovara ha bi hinerê gelek dewlemend e û ji kaniyên folklora kurdî "Botan û Mûkiryan" pêk hatiye û her dem ji bo xizmeta we ye.
Bixwînin û belav bikin da ku em folklora xwe ji windabûnê biparêzin, ji ber ku gel bi folklorê gel e. Mirovê ku folklora xwe jî nizane ne mirov e!

Kovara Muzîk û Hiner
1/1/1981 Uppsala-Swêd

www.arsivakurd.org

WÊNE Û NOTE

Ji devê hevalekî pir delal



Folklora kurdî hemî li nik mitriban e. Çi gava yek bixwaze folklora kurdî binase û fêrî bibe. Divê divê ew kesên ha biçin nik mitriban û folklora kurdî ji wan fêr bibin. Lê mixabin gelek kurdên me hene dibêjin:-

Çawa em ê herin nik mitriban û fêrî folklora xwe bibin. Ji ber ku ew kes in nizimtirî me ne ji aliyê civakî de.

Kak Mihemed Ezîz Zaza

www.arsivakurd.org

NÛÇEYÊN HINERÊ

Tîgran Sîmonyan

ERMENISTANA SOVYETISTANÊ

Xebata hinerê li jêr ala aştî û sosyalîzmê bi saya serê mirovên nivîsevan, hesbestvan û hinermendên nîştimanperwer roj bi roj pêşde diçe.

ÎRANÊ

Hindek ji cihên sema, tiyatro û sînemayê ji aliyê polîs ve hatin sotandin gava Xumeyniyê emperyalîst hiner qedexe kir. Hindek ji wan cihan jî bûne zîndan ji bo mirovên sitembar û aştîxwaz yan jî bûne baregeh ji bo faşîstên xwînmêj.

TIRKIYÊ Û SÛRIYÊ

Van rejîmên emperyalîstan ta niha mafên çandî nedane gelên Kurd, Ermenî, Aşûrî û Suryanî û naxwazin bidin jî. Lê dixwazin sitemên xwe li dij gelên aştîxwaz bi alîkariya polîtîka emperyalîzmê bêtir û girantir bikin.

www.arsivakurd.org

Mem och Zin

Det kurdiska nationaleposet i tolkning
och översättning från engelska av
Robert Alftan.
Med en inledning av
Gisbert Jänicke.
Samt översättarens
radiodramatisering av eposet.

REVOLT-FÖRLAGET

Beşir S. Botani

Stran

Helbest

Muzik

—1—

Mem û Zîn bi zimanê Swêdî, wergerandina kak Robert Alftan û pêşgotina kak Gisbert Jänicke. Bixwîne û bide xwendin.

Aştî û evîn, bixwîne û belavke.

Stöd Världsnaturfonden
WWF, World Wildlife Fund
Fituna, 140-41 Sorunda. Tel 0753/4-41-43 Postgiro 1974-5 Bankgiro 171-8428

EM JÎ DIXWAZIN BIJÎN!

www.arsivakurd.org

Cejna sersala we pîroz be!

1981!

Yê ku bixwaze jîna xwe pêşbixîne!!
Divê muzîkê bixwîne!!

Jîna mirov bi muzikê jîn e
Laşê wî jî her dem bi evîn e

Mirovê jîr, ji muzîkê re tî ye, çiku muzîk jîn e û jîna bê muzîk, wek erdê bê av e.

Jîn bi hinerê rengîn dibe, ciwanî û xweşiya wê muzîk e.

Beşîr Botanî

Xudan û berpirsiyarê kovarê, wêne :- Beşîr Botanî

Nivîsarî û çap :- Sergon Mîxo

Ji bo alîkariyê,
postgirokonto 453 46 47-5
Bashir Botani
Sweden

www.arsivakurd.org